Pfadibewegung Schweiz
Mouvement Scout de Suisse
Movimento Scout Svizzero
Moviment Battasendas Svizra



# Rêçevan

ku

## hevaltiyê deynin / bilîzin / werzîş û muzîkê bikin / dema vala dagirin
## xwarinê çêbikin / destkariya hunerî bikin / ji bo keç û kuran

**Pfadi tê wateya tecrubeyên nayên jibîrkirin, hevaltî û kêfxweşiya mezin a bi zarok û ciwanên di heman temenî de.** Li navendê jiyan bi hev re dimeşe. Li vê derê zarok ziman, lîstikên nû û tişta zarok dixwazin li Swîs bikin fêr dibin. Ew dikarin pev kevin, bilîzin, bikenin, bistirên, xwarinê bikelînin û destkariya hunerî bikin. Di heman demê de zarok fêr dibin berpirsyariyê ji bo xwe û ji bo yên din hilgirin û dema xwe ya vala bi xwe dagirin.

Kom zêdetir rojên şemiyê paşnîvro ji bo  dudu heta çar saetan tên cem hev. Carinan jî ji bo giştiya dawiya hefteyê ango ji bo çend rojan çûna wargehê. Ev çalakî bê amadebûna malbatan pêk tên û ji aliyê ciwanên gihiştî ve tên rêvebirin. Ev ciwan çê hatine perwerdekirin û ji aliyê mezinan ve tên çavdêrîkirin.

Pfadi sazîbûna ciwanan a herî mezin a li Swîs e û ji aliyê siyasî û olî ve serbixwe ye.

**Tev dikarin di nava Pfadi de hevkariyê bikin.** Pfadi li gorî çalakiyên din erzantir e. Ger buhayê wê ji bo pevkarî û tişt û miştan bilind be, li Pfadî her dem em çareseriyekê dibînin!

Pfadi li gelemperiya Swîs wekî koman tê pêkanîn. Ji bo hemû cureyên pirsan û pevkariyê hûn dikarin bi kesên li jêrê re bikevin nav têkiliyê: